

BIRÇÎ JI BÊHNÊ TÊR DIXWE ?

Çi kar bi dest min biketa, minê bikira..... Heger xulamtiya malan ji be. Yekî nasê min, ji min re got: "Ez mirovekî Tirk dinasim, karkerek ji wî re lazime, te rêkim ba wî" "Heger li karkereki digere...ma wê ji min çêtir bibine?...Lê çi kare...?" "Bawer ke nizanim.....!" Navnişana mêrikê Tirk da min, min ji ji ba wî berê xwe dabû ba mêrik. Min pêwîst dît ku zû bi zû herim balê, tîrsa min ew bû ku hinek berî min herin û kar ji dest min here. Derbasî biroya mêrik bûm, du şexs li balê rûniştibûn, hindek mabû ku rehên dilê min biqetyana, min ji xwe re got: „Hebe tunebe ew ji ji bo kar hatine“ Lê ya baş ew bû bi derbasbûna min re herduwan xatir xwestin, mêrik ji got min: "Bûrin afendim...." -Abê (Agabey)...ez li kar di gerim. Wekû ku wî bawer nekîr, di hizrya min de beşî û pêre-pêre dest bi jiyana û tecrîbyên xwe kiribû..... -Temenê min nuha pêncî û pêncê salin, serpêhatî bi ser min de hatin û gelek cecêb ji min ditîne, xweşî û nexweşî, piştî wî temenî gihame encamê... jiyanez ez fêrkerim ku çav û guhê xwe her tim vekim. Jiyanez ez fêrî vê meselê kirim .....bo nemûna -mirovekî birçî ji bêhna goştê biraştî têr di xwe.....yan têr na xwe? Gereki ez bersiva mêrik bidim...gelo wê bi çi bersivê razî be? Jêre bêjim ...têr di xwe...yan têr na xwe? Erê berî min ji herdu mêwanên xwe pirsibû û wî bi xwe bersiv dabû Dema dît ku ez ramiyam, pîrsa xwe disa pîrsî: "Têr di

xwe.....yan têr na xwe... ?" Ji tîrsa ku kar ji dest min here, canê min tev di recifî, wekî dema ez çagirtî bûm û di cizmûna lîsa de bûm. Disa pîrsî: "Erê bêje... têr di xwe.....yan na... ?" -Çiqasî birçîye ? Ew bi pîrsa min bihiştî mabû: "Birçî.....birçî !" -Têr na xwe -Raste...têr na xwe!...her mirovek li gor zanîna xwe li ser vê rastiyê bersiva ve pîrsê didê -Belê -Tu merovekî zaneyî, min tu di dî kar de qebûl kirî. Mirovek li ba min kar dike ezê wî bidim sekinandin. Disa ez kirim nav ramanan wekî aveke sar bi ser min de berdê ji ber ku bixwe dizanîm ku bêkarî û tuncbûn çiqasî hisiyeta mirovan û camêran wînda dike. -Ez wê yekê nakim....Na xwazim rizqê kesekî bi birim. -Na! Na, ne ji bo te wî ji kar tavêjim, min di jiyana xwe de mirovekî wekî wî serhişk nedîtiye. Tu dikarî bi guhên xwe serhişkiya wî bi bihiştî. Li zengil xîst xîzmetkarê biro derbasbû: "Bêje Şivano Efendî, bila were." Bi derbasbûna Şivan re dilê min ji bo wî reqîsî, xortekî lihevhatî û bi hurmet, serhişkiya ku mêrik bi wî ve girêdayî lê nediyar bû, mêrik bi dilsarî û qeşmerî jî pîrsî: "Mirovekî birçî ji bêhna goştê biraştî têr di xwe?" Çavê Şivan sor bûn, hevrikî lê diyar bû û ber bi mêrik ve hatibû: "Erê, têr di xwe." "Têr na xwe" Mêrik lê veşerand. -Têr di xwe. -Têr na xwe. Mêrik berê xwe da min û bi hêz got: "Tu di bîni, di bihiştî çawa rastiyê wînda dike...Ma têr dixwe?" Min bersiv da: "Na têr na xwe"

"Helbet, helbet têr naxwe" Berê xwe disa da Şivan: "Ji vê kellişkê de kar ji bo te li ba min tune." Şivan bi axiftîna mêrik re rûgeş û şa dibû, bi dilşahi xatir xwest. Ez bi xwe di wê guhertinê de bihiştî mabûm. Min nikarî meselê famkim.....lê zû mêrik ez şiyar kiribûm û disa ji min pîrsî bû: "Têr dixwe?" -Na.....! -Raste, ez her wê bersivê dixwazim, mihtaciya min bi mirovê weke te zane û mentiqî (logik) heye, berî hertiştî mentiq, mentiq, logik efendim.....tu têngihîştî...? Bi fermana mêrikê Tirk min berê xwe dabû oda li kêleka biro ku kar ji dest Şivan bigirim, min li ber xwe dabû ku Şivan dilxweş bikim û min disa got wî "Bi beşîne ez bûme sedema ku te karê xwe wînde kir." Şivan devliken li min zivirî û bersiv da: "Nexêr.....tu nehata mirovekî din wê bi hata, lê her daxwaza min ji ew bû." -Bi bûrîne, heger te bi gota têr na xwe çî dibû, dibe te karê xwe wînda nekira. -Ez niha nikarim ji tere bêjim, rojek, duduwan tu bi xwe de pê bigihîjî, ber min şexs mirov guhertine, ez yê heftan bûm, min nikarî ji bîlî du mehan zêdetir bi qedanda, hêvîdarim tu demeke zêdetir biqedînî, Xwedê sebrekê hîde ber dilê te. Axiftinê Şivan ez dinav fikir û xeyalan de mendehoş kiribûm, bi fikir û ramanên xwe re gelekî dûr diçûm, bi gaziya xîzmetkar re şiyar bûbûm. -Te di xwaze Mûrik di biro de bi sê taciran re ketibû bazarê tiştê dikirin, lê bi xwe

Amer Çelîk nizani li ser çî bazarê dikin, bi derbas bûna min re ji min hat pîrsîn: "Mirovekî birçî ji bêhna têr di xwe?" -"Têr na xwe" Li min nehêrî û beşîstî, disa berê xwe da wan:-"We bihişt...hun di xwazin maşê min bi xwin." Yekî ji wan destê xwe ber bi min ve kir û berê xwe da wî û got: "Têr di xwe....têr dixwe! Em ji bîlî sedê pêncan pêde nadin" -Neyapiyor sin (abê) mentiq-mentiq...berî hertiştî mentiq....ji sedî pêncê? Ji bo xatirê we bila wê carê pênc bin" Wê rojê şexs çaran bani min kirbû û her ew pîrs ji min dihat pîrsîn helbet bersiva min jî (têr na xwe) bû. Rojê zêdetirî bîst çaran ew pîrs ji min dihat pîrsîn, min weha heft meh li ba wî qedandin, bi dirikande mêrik yekî ji wekî min li ba wî ne domand, gelek caran min hêvî dikir ku xulamtiya belengazekî bikim û ne bibim şirikê derewên mêrikê Tirk. Rojekê mêrik di bazarê de asê bûbû di xwest ku ji sedî dehan bîstine, gazî min kir wekî her car û ji min pîrsî: "Mirovekî birçî ji bêhna goştê biraştî têr dixwe?" Ez bi dengêkî bilind qiriyam: "Têr di xwe." Çavê mêrik beloq man. -Têr çî.....? -Têr dixwecececece... -Têr dixwe, yan têr na xwe? -Têr dixwe -Têr na xwe -Têr dixwe û zik lê di nepixê! -Têr na xwe.

Mêwan dikenyan, ez pê hisiyam ku ew bi xwe bi mebesta min gihiştin, ez ber bi mêrik ve çûm û heya dengê min derket min jêr got: "Têr dixwececececececece...! têr dixwe" Derketim zikakê çend caran bêhna xwe kişand û berda, lê mixabin ku mêrikê Tirk ji min dûr ne diket, raman li min bêtam û sar kiribûm, radizam dimêşyam, bi hûde diçûm, her ew bi min re bû. Mêrik ji bo min bûbû sedemê êşêke dijwar, rojê bi dehê caran min di got: Têr dixwe.....têr dixwe.....têr dixwe.....

KURTE HELBEST JI DEST RE

1 Serê xwe berda nav destên xwe xwest biranînên xwe bigire lê... çavên wî Çavên wî di nav tiliyan re .. Çavên wî herikîn! 2 Peyayê herfê wê çî ji destên ku di tîna jinekê de werivîn re bêje? 3 Li neynika destên xwe nêrî wêne yê jîneke şilû dît. Destê xwe livand, canê wî di gerînoka pencan de werbû! 4 Di jîbîrkirinê de ramiya, hest dikir ku destên wî ji wî vedibin 5 Destê wî ji wî nedibûn, weke ku ew destên wî bi xwe bin 6 Carekê biryar da, ku dest jê berde, herdu destên xwe herdu destên xwe.... diyari wê kirin! Teve ku di zanibû ku gîş canê wî di tiliyan de civiya ye.

Abdulkadir Mûsa

Porzera Şingalî

Erê tu dizani? Hemû dastanên evîne êt min gotin Min ji serê xwe birin, û jîbir kirin, û hemû şîretên evindaran. Erê tu dizani? Rondikên hemû ezmana, û barana çavan... li ser dêmên ji yasminê. Periyê.. li ber mirnê bû, li ser goristana.. bela dibû, û tîrêjkên diniya yê hiliyan, lê.. gava rabû, dît leylane, tu dizani; stêrkên hemû komika ji baweriyê diçûn ava! ... Porzera min! Qurbanîya xweşî û jehra perîya min bû, û xencerên gunchkariyê.. li eniya wê de. Aya dibîni? Herdo çavên te ji bo stêrkê... ronahi bûn, û dêma te.. roj mest kirin. Felek xayin bû, li ser hemû parçerêkan... şîrani bû ji nişkave difriya, ev çî rêbû megirtî, ewrê reş û tarî seranserîn, li ser hemû şopa, û dibin mede derya yeke xapîn dibîni, heçkû gulên baçxan bûne stîrî û derzî û şûr bû ew çavê wê yasminê ... Porzera min! Belkî ew Felek bû cergê minî birindar vekişande herdo çavên tey şîn; û ew tobe û ew sonda ez pê derweş bûm da ji hemû sozên evîne dûr kevîm te bi porê xwey zêrin şkênand bû. Ji min vebe; cy zaroka di evîna xwe de Me ne evîna canê birrî, tu bi wî şûrî birin kirin. Ez sond dixum, bi şîniya çavên tey zelal, tu ji hemû dastanên didariyê û ji çîrokên evîna pîr çî re zarokî...hîn piçûdî. Dîlbera min! Tu guhdarî? Dastan û peyvên min, kul, rondik û biranan piştguh dikî Lê! Dibêjtî dût ji xweşiyê re, û bi didareka her cejnêkê qayil dibî. Çend cejn...û çend didarin? Çend hêstîr.. di navbera wan ditîna? U çendî de girim? Çendî.. tê barîni? Hilgire.. ji nû ve Ey hemû stêrkên duniya yê, pêla evîne di nava dilê min de biçîne. Pêxweşî...pêxweşî ji te re! Hemû keçên Iraqê Ji giranî.. Agirê min hilnegirt bûn, belê te bi paqîjîya xwe hilani û hemû derda davêjî şevan berber dikî û ji hemû ezmanan belê bi hemû diwaran re hevrikî. Rondikên te çîqas hişkin... Şingaliya min, bi dest û lêvan stîriyên deriyê dojê di çîni. Ji bo evîne û xewna ciwan û evindariyê. Felek .. bi wer xayin ket, hûn ji hev kirin û dût kirin.

Helbest: Mirza Dinnayi Wergêran ji Erebi: Hadî Babeşê